



Belavoka zanyariyan bo penaberên pejirandî, penaberên bi demkî pejirandî, biyaniyên bi demkî pejirandî û penahxwazên li Kantona Berne'ê

Zanyariyên kurt ser rêzikên girîng ên kantonî

Naverok

1.	Bi xêr hatine Kantona Berne'ê!	2
2.	Lêmayîn/Jiyankirin.....	3
3.	Tevlêbûn	4
4.	Hêsankirina tevlêbûnê	5
5.	Tenduristiya Giştî	6
6.	Arîkariya civakî	7
7.	Navnîşan û girêdankên girîng	8

Rêzeya navan

N	Penahxwaz, karta pênaseyê N
B	Penaberên pejirandî, karta pênaseyê B
F-FL	Penaberên demkî pejirandî, karta pênaseyê F
F-VA	Demkî pejirandî, karta pênaseyê F

1. Bi xêr hatine Kantona Berne'ê!

Em bi vê belavokê dil hene we ser rêzikên girîng agahdar bikin ku li Kantona Berne'ê bo penaberan, kesên demkî pejirandî û penahxwazan tên bikaranîn. Ev zanyarî "Zanyariyên kurt bo penaberan û kesên demkî pejirandî" dikemiklîne ku Wezareta Dewletê ya Koçberiyê (SEM) weşandiye.

Kantona Berne'ê tevlêbûna penahxawzan û penaberan ser bingeha qanûna kantonî ser arîkariya li beşa penahxwazî û penaberiyê (SAFG) han dide. Kantona Berne'ê li bendê ye hûn bi awayê çalak tevlêbûna xwe zû pêk bînin, wek mînak bi hînbûna zimên û hewldana ku ji hêla malî ve serbixwe bin.

Hûn ê di vê belavokê de zanyariyên kurt ser maf û erkên ku bo rewşa we bi kar tên, herwiha girêdank û navnîşanên sûdmend peyda bikin.

Daîreya Karên Tevlêbûnê û Koçberiyê,
Birêveberiya Tenduristî, Karên Civakî û Tevlêbûna Kantona Berne'ê
(Amt für Integration und Soziales,
Gesundheits-, Sozial- und Integrationsdirektion des Kantons Bern)

Ev belavok bi zimanên jêrîn tête peyda kirin: Almanî, Fransî, Tîgrînya, Farisî, Erebi, û Kurmancî.

2. Lêmayîn/Jiyankirin

N Penahxwaz heya rêbaza wan a penahxwaziyê temam bibe li cihên komkî de dimînin. Bo kesên ku bi taybet zîyanbar in û kesên piçûk û tenê awarte hene.

B Hemû penaberên pejirandî, penaberên demkî pejirandî, biyaniyên demkî pejirandî li Kantona Berne'ê di bingehê de dê li qonaxa yekem li cihên komkî de bijîn. Kesên pispor dê li wir li we muqate bibin û hûn ê jiyana li Swîsê nas bikin.

F-FL

F-VA Hema ku hûn gihîştin armancên xwe yê tevlêbûnê, hûn dikarin li apartimana xwe yan maleke hevbeş bimînin. Şêwirmendê berpirsê we dê bo peydakirina cihê mayîne li devera we piştevaniyê bike. Bo vêya, ew divê di yek ji zimanên li cihê mayîne yan cîwarbûnê gihîştibin asta A1 û kar yan hînkari dest pê kiribin.

Bo zarokên xwedan zarok, kesên piçûk û tenê û kesên ku bi awayê taybet zîyanbar in awarte hene.

B → Bo zanyariyên pirtir ser armancên tevlêbûnê li beşa "Tevlêbûn" li jêrê binêrin.

F-FL

Penaberên pejirandî dikarin biçin apartimana ku bixwe kirê kirine, heya ku kirê pêdiviyên wan pêk bîne, hetanî eger negihîştibin armanacên tevlêbûnê.

Bingeha Qanûnî

Cihê mayîne yê penaberên pejirandî, penaberên demkî pejirandî, kesên demkî pejirandî û penahxwazan li Qanûna ser Arîkariya Civakî bo Penahxwaz û Penaberan de heye (SAFG) (Art. 35-40 SAFG).

<https://www.belex.sites.be.ch/frontend/versions/1884>

3. Tevlêbûn

N Penahxwaz bi awayê çalak bo tevlêbûna xwe li bazara kar amade dibin û şîyanên bîngêhîn û zanîna bîngêhîn a zimankî fermî yê cihê mayînê hîn dibin hevdem jî li benda biryara penahxwaziyê dimînin. Ew neçar in li birêveberiya cihê mayîna komkî de li gor hêz û karîna xwe beşdar bibin û bikevin bernamêyên tevlêbûnê (bernamêyên ne-sûdbar ên karkirinê, xizmetên piştevaniya zimên ên asta kêr, rojên zanyariyan û kursên şîyanên kilîtî).

N Kantona Berne'ê li bendê ye hûn zû û bi rêyeke çalak, şîyanên pêdivî bo beşdarbûna li hînkariya karkirin yan pêşeyî fêr bibin. Bi taybet hûn neçar in:

- B** • zimankî fermî hîn bibin,
- F-FL** • bo debara jiyana xwe di zûtirîn demê de çavkaniyên xwe pêk bînin,
- F-VA** • perwerdeya pêwîst bo beşdarbûna li jiyana aborî, civakî û çandî hîn bibin
- ewlebûn û rêza giştî û nirxên Destûra Federal raçav bikin
- bi hemû rayedar û dezgehan re hevkarîyê bikin.

B Şêwirmendê berpîrsê we dê bi we re ser plana ferdî ya tevlêbûnê bo armancan li hev bike. Ev plan wan kiryanan rave dike ku bo bidestana armancên giştî yê tevlêbûnê û armancên ferdî yê tevlêbûnê pêwîst in. Herwiha, rola we ya ferdî û roja dawîn a gihîştina armancan dê were ravekirin.

Hûn neçar in xwe bispêrin plana tevlêbûnê. Gihîştina armancan bi rêkêkî tê venêrîn. Eger hûn ji ber şaşiyên xwe nikarin xwe bi plana tevlêbûnê re bikin yek, ceza dikarin ser we werin sepandin, wek mînak kêmbûna arîkariya civakî.

Bîngêha Qanûnî

Mijarên bo tevlêbûna penaberên pejirandî, penaberên demkî pejirandî, kesên demkî pejirandî û penahxwazan li Qanûna ser Arîkariya Civakî bo Penahxwaz û Penaberan (SAFG) de hatiye (Art. 4, Art. 14-16 SAFG).

<https://www.belex.sites.be.ch/frontend/versions/1884>

4. Hêsankirina tevlêbûnê

- N** Bo arîkariya we bikin bigihîjin armancên tevlêbûnê, hevparê piştevaniya navçeyî ji aliyê Kantona Berne'ê ve piştrast dike li her dera pêwîst xizmetên
- B** piştevaniya tevlêbûnê hene. Bi taybet, Kanton di warê piştevaniya destpêkê, hînbûna zimên û rênîşana rojane, tevlêbûna kar û perwerdeyê, herwiha di
- F-FL** warên din ên jiyana têkildarî tevlêbûnê de xebatê dike.
- F-VA** Di hemû navçeyên kantonê de kurs, bername û cihên hevdfîtinê hene ku hûn jiyana li Swîsê nas dikin û bi kesên xwecih re pêwendiyê datînin. Ji van xizmetan sûd wergerin!
- Bo zanyarî û tewsiyeyên ser tiştên li navçeya we hene, ji kerema xwe bi şewirmendê berpîrsê xwe yan hevparê navçeyî yê berpîrs bo mijarên penahxwazî û penaberiyê li devera mayîna xwe re pêwendiyê dayînin.

→ Navnîşanên hevparên navçeyî dikarin li vir peyda bikin "Navnîşan û girêdankên girîng", li jêrê binêrin.

5. Tenduristiya Giştî

N Kantona Berne'ê dê sîgorteya tenduristiyê bo we dabîn bike. Sîgorteya tenduristiyê tenê beşek ji xercê muqatebûna bigehîn a bijîşkiyê dide. Kesê **F-VA** sîgortebûyî hertim beşekê bixwe dide (franşîz, xwe-sîgortebûyî). Şirketa tenduristiyê ya sîgorteyê diravê derman û ilaçên ku derveyî muqatebûna bingehîn nade.

Şêwirmendê berpîrsê we dê we bişîne bijîşkekî (bijîşkê muqatebûna sereke) û kûponeke ferdî dide we, ku hûn divê bi hev re bi karta xwe ya pênaseya biyanî dema serdana bijîşk de nîşan bidin. Eger hûn nexweş in yan qeza kiriye, hûn divê hertim berê serdana bijîşkê xwe yê muqatebûna sereke bikin, ji bilî demên lezgin de.

B Hemû kesên li Swîsê dijîn divê sîgorteya wan a tenduristiyê hebe. Eger hûn **F-FL** arîkariya civakî wergirin, xercê sîgorteya we ya bingehîn û neçarî ji arîkariya we ya civakî heya qasekê tê dayîn. Hûn dikarin hilbijêrin bi kîjan şirketa sîgorteyê werin sîgortekirin.

Kesê sîgortebûyî hertim tenê beşeke xercê muqatebûna bingehîn a bijîşkiyê dide. Kesê sîgortebûyî hertim beşekê bixwe dide (franşîz, xwe-sîgortebûyî). Şirketa tenduristiyê ya sîgorteyê diravê derman û ilaçên ku derveyî muqatebûna bingehîn nade.

Hûn ê ji şirketa xwe ya sîgorteyê kartekê wergirin, ku divê dema serdana bijîşkê xwe yan wergirtina dermanan ji dermanxaneyê bi we re be.

→ Hûn dikarin zanyariyên pirtir ser pergala tenduristiyê bi gelek zimanan li "Rênişana Tenduristiya Swîsê" peyda bikin.

<https://www.migesplus.ch/publikationen/gesundheitswegweiser-schweiz>

Bingeha Qanûnî

Muqatebûna bingehîn a tenduristiyê bo penaberên nasbûyî, penaberên demkî nasbûyî, kesên demkî nasbûyî û penahxwazan li Qanûna ser Arîkariya Civakî bo Penahxwaz û Penaberan de heye (SAFG) (Articles 9, 21 and 27 SAFG).

Qebûlkirina xercên tenduristî û bijîşkî ya penaberên nasbûyî û demkî nasbûyî ji aliyê arîkariya civakî ve li Qanûna ser Arîkariya Giştî ya Civakî (SHG) de heye.

<https://www.belex.sites.be.ch/frontend/versions/1884>

6. Arîkariya civakî

N Eger hûn nikarin piştevaniya xwe bikin, hûn dikarin daxwaza arîkariya civakî bikin. Ev jiyana we piştrast dike û debara jiyana we, muqatebûna bingehîn a **B** bijîşkiyê û xanî dike. Herwiha rê dide ku hûn di jiyana civakî de beşdar bibin û xercê tevlêbûna we ya pêşeyî dide.

F-FL

F-VA Hûn neçar in zanyariyên rast bo xizmetên civakî dabîn bikin û divê eger arîkariya civakî werdigirin rêzikên xizmetên civakî bişopînin. Hûn neçar in hemû amûrên xwe yê malî yê heyî ragihînin. Hetanî eger hûn ji aliyên sêyem arîkariyê werdigirin, hûn divê vêya ji arîkarê civakî re rapor bikin.

Hûn divê her karî bikin bo rakirin, kêmkirin yan dabînkirina pêdiviyên xwe. Di vê de bi taybet divê beşdarî kiryarên guncaw ên tevlêbûnê bibin û karekî maqûl bipejirînin.

Eger hûn erkên xwe bînpê bikin yan rêzikan neşopînin, xizmetên civakî divê gavên qanûnî û cezayan ber çav bigire. Ev dikare bibe sebeba kêmbûna arîkariya civakî. Kêmkirin divê angorî bin û tenê ser kesê sûcdar bandorê dayînin.

Hema ku rewşa we ya malî baş bû, hûn divê dîsan diravê arîkariya civakî ku we wergirtiye vegerînin.

Divê sûdên rifaha civakî yê ku bi neqanûnî hatine wergirtin werin zivirandin. Sûistifadeya ji arîkariya civakî dikare bibe sebeba derkirinê.

B Xizmetên civakî dê arîkariyê bidin we tevlêbûnê bikin û ji hêla malî ve serbixwe bibin. Bo vê armancê, planeke tevlêbûna ferdî dê bi lihevkirina we **F-FL** were çêkirin. Hûn neçar in xwe bi vê plana tevlêbûnê re bikin yek û zûtirkê şiyarên pêwîst bo destpêkirina kar yan hînkariyê fêr bibin.

F-VA

Bingeha Qanûnî

Arîkariya civakî bo penaberên pejirandî û penaberên demkî pejirandî li Peymana ser Arîkariya Civakî (SHG) de ye.

Arîkariya civakî bo penahxwazan û penaberên demkî pejirandî li Qanûna ser civakî bo Penahxwaz û Penaberan de ye (SAFG) (Art.17-26 SAFG).

<https://www.belex.sites.be.ch/frontend/versions/1884>

7. Navnîşan û girêdankên girîng

Rayedarên koçberî û tevlêbûnê yê kantonê (Kantonale Migrations- und Integrationsbehörden)

Birêveberiya Tenduristî, Karên Civakî û Tevlêbûnê
Daîreya Karên Tevlêbûnê û Civakî
Wezareta Penahxwazî û Penaberiye
Gesundheits-, Sozial- und Integrationsdirektion
Amt für Integration und Soziales
Abteilung Asyl und Flüchtlinge
Ostermundigenstrasse 99B
3006 Bern
031 636 53 00
www.be.ch/gsi

Xizmeta Koçberiyê ya Kantona Berne'ê
Navenda Mişteriyên
Migrationsdienst des Kantons Bern
Kundenzentrum
Ostermundigenstrasse 99B
3006 Bern
031 633 53 15
www.be.ch/sid

Hevparên Navçeyî Regionale Partner

Navçeya Bajarê Bern'ê û dorbera wê (Niştecihên Bern'ê,
Bremgarten nêzîkî Bern'ê, Köniz, Muri nêzîkî Bern'ê,
Ostermundigen, Zollikofen)
Region Bern Stadt und Umgebung (Einwohnergemeinde
Bern, Bremgarten bei Bern, Köniz, Muri bei Bern,
Ostermundigen, Zollikofen)

Bajarê Bern'ê, Birêveberiya Perwerdeyê, Karên Civakî û
Werzişê
Navenda Têkildar a Tevlêbûna Bajarê Bern'ê (KI Bern)
Stadt Bern, Direktion für Bildung, Soziales und Sport
Kompetenzzentrum Integration der Stadt Bern (KI Bern)
Effingerstrasse 33
3008 Bern
031 321 60 36
www.bern.ch/asylosozialhilfe
asylosozialhilfe@bern.ch

Navçeya Bern-Mittelland (devera îdarî ya Bern-Mittelland
ji bilî şaredariyên li navçeya bajarê Bern'ê û dorbera wê):
Region Bern-Mittelland (Verwaltungskreis Bern-Mittelland
ohne die Einwohnergemeinden der Region Bern Stadt
und Umgebung):

Xaça Sor a Swîsê ya Kantona Bern'ê
Schweizerisches Rotes Kreuz Kanton Bern (SRK Kanton
Bern)
Bernstrasse 162
3052 Zollikofen
031 919 09 59
migration@srk-bern.ch
www.srk-bern.ch/migration

Navçeya Berner Jura'yê - Biel/Bienne - Seeland (devera îdarî ya Berner Jura'yê, Biel/Bienne, Seeland):
Region Berner Jura - Biel/Bienne - Seeland
(Verwaltungskreise Berner Jura, Biel/Bienne, Seeland):

Xaça Sor a Swîsê ya Kantona Bern'ê
Schweizerisches Rotes Kreuz Kanton Bern (SRK Kanton Bern)
Solithurnstrasse 136
2504 Biel
032 329 32 73
Migration.sj@srk-bern.ch
www.srk-bern.ch/migration

Navçeya – Oberaargau'yê (deverên îdarî yên Emmental û Oberaargau'yê):
Region Emmental - Oberaargau (Verwaltungskreise Emmental und Oberaargau):

ORS Service AG
Lyssachstrasse 23 (2. Stock) (qata 2yem)
3400 Burgdorf
bern@ors.ch
www.ors.ch

Navçeya Berner Oberland'ê (deverên îdarî yên Thun, Interlaken-Oberhasli, Frutigen-Niedersimmental, Obersimmental-Saanen'ê):
Region Berner Oberland (Verwaltungskreise Thun, Interlaken-Oberhasli, Frutigen-Niedersimmental, Obersimmental-Saanen):

Asyl Berner Oberland (ABO)
Asyl Berner Oberland (ABO)
Scheibenstrasse 3
3600 Thun
033 552 09 09
kontakt@asyl-beo.ch
www.asyl-beo.ch

**Navenda yarmetiya qanûnî
(Rechtsberatungsstelle)**

Navenda yarmetiya qanûnî ya Bern'ê bo kesên pêdiviya wan heye
Berner Rechtsberatungsstelle für Menschen in Not
Eigerplatz 5
3007 Bern
031 385 18 20
www.rechtsberatungsstelle.ch